



Dr Nûredîn Zaza
1919 - 1988



Osman Sebrî
1905 - 1993

- Xebat ji bo :** * Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd yê netewî di çarçewa yekîtiya wellêt de .

Ji weşanên Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurd li Sûriyê - YEKÎTÎ
Email : Newroz95@hotmail.com

Hejmar(65) Berçile 2005 z-2617 k Buha (15) p.s

Binpêkirina mafên mirovan li Sûriyê

Li gor biryara rêxistina Komela Giştî ya Yekîtiya Netewan, ku hersal roja 10- ê Berçile, bi roja bîranîna mafên mirovan li seranserî cîhahê be. Vêca li Sûriyê jî hinde partî, navend, kes û komele, nemaze rêxistinên mafên mirovan hewldidin ku, dengê xwe bighênin xelkê xwe û derdoran.

Taybetmendiya rewşa Sûriyê di siha rijîma tek-partî de, digel tunebûna qanûneke kêrhatî bona hebûn û lebata partiyên, dike ku, mafên mirovan li Sûriyê her û her bêne binpêkirin û dadgehên henin jî, ne ciyê rêzgirtin û baweriyê bin. Lewre jî, biryarên wan dadgehên awarte, li ba partiyên siyasî yê ku, ji rijîma Be,s re ne berdevik, nayêne pejrandin û her ciyê şermezarî û protestokirinê ne. Ji ber ku, ew biryarina serûber bûne navnîşanên balkêş ji binpêkirina mafên mirovan re. Loma jî parta Yekîtiya Demokrat a Kurd li Sûriyê, li gel hêz û pattiyên dî, di çarçewa damezana Şamê (Îlan Dîmeşq) de, li beramber binpêkirina mafên mirovan xwedî helwest e û her dê li pîrsa Kurd û demoqrasiyê li gor bernama xwe ya siyasî xwedî derkeve.

Divê baş bête zanîn û bawerî li cî be ku, çand û mafên mirovan bêne rêzgirtin, parastin û bi cîkirin, rê li ber çand û dezgehên demoqratik vebe. Ewqas çareserîna pîrsa Kurd nêzik dibe û derî li ber nijaperest, sergerim û qafhişkan tene girtin .

Sînorê Yekta

Dijberiya Kurdan

Xala hevbeş ya Turkiyê û Îranê dijberiya Kurdan e

Dewletên Îran, Turkiyê û Sûriyê herdem li ser xalekê li hev dikin û dijî disekinin , ew jî **pirsgirêka Kurd** e . Vê carê jî Mencehr Mutekî , wezîrê deve yê Îranê di sefereke 2 rojî de gihîşte Enqere û bi rayeder û berpirsiyarên bilind yê Turkiyê re hevdiştin û gotbêj kir. .. Lê , li gorî rapora ragihandinên Turkiyê , her du wezîrên derve yê iran û Turkiyê li ser hin xalan li hev kirin . **Pirsgirêka PKK** ê, **pêşgirtin ji parvebûna Îraqê û berlêgirtin ji belavbûna ne ewlekarî ji bo herêmê,** xuya û aşkira ye ku, merema wan her2 welatan ji barvebûna Îraqê û belavbûna ne ewlekariyê , li deverê ... ku wan herdem dijî Kurd li hev kiriye....ji R. **Agirî**

Şerê ezîti û kesebaziye pêdivî ye

Memê alan

Ez naxwazim di vê mijarê de gotinên qelew û aloz bi kar bînim , an jî di dor giran re bizîvirim û xwedevanan sergêjî bikim . Ji dêvla wê , ez hêvî dikim ku kanibim bi çend şor û peyvên hindik - rindik , hêsan û yekser armanca mijara xwe bighînim xwendevanan û ji wan re , pîsîti û xirabiya van xeysetan şirove bikim .

Her mirovek , ji zikmakîye de , hemî riweştên rindî , nerindî, başî û xirabî , rastgo û vir H.W.D . pê re peyda dibin , lê vemirî û di xew de ne . Hino hino li gorî şeweya perwerdekirina wî , hin ji wan xeysetan gur û geş dibin û hin ji wan jî, weke xwe dimînin . vêca her mirovek li gorî xeysetên ku tê de geşdibin, an wê qencî û rindiyê bike yan jî, wê bi pîsîti û xirabiye de biçê.

Ev herdu xeysetên ku bûne navnîşana mijara me , ji hemî riweştên nebaş , pîstir û genîtirin û bi hev ve girêdayî ne . Ne tenê weha , hê bi xwe re tiştine din jî, nebaş di mirov de vedijînin . Mîna : vir û vûtan , qelzandin , dizî , propegandayên nebaş

Çima em wiha dibêjin ? Ji ber ku , mirovê ezezi û keysebaz ji xwe hez e. Yanê berjewendiya wî ya taybet, di ser berjewenda tevan re ye . Ta ku armanca xwe bibe serî , wê hemî şeweyên çewt , xirab û nizim bide ber xwe , nîrx û encama wê çi dibe jî bila bibe .

Gelo, eger em hinekî rûpelên dîroka tevgera Kurd li Sûriyê biqulibînin, hûrik hûrik di sedemên perçebûna wê de , mijûl bibin , ewa ku niha li pêş me bûye asteng û

aloziyek mezin û hiştî em jar bimînin , baweriya gelê me bi me ne pihêt be û em nizanin bi çi rengî û kîngê bi ser hev wînin . Ma ne berê û ta niha û siba jî, sersedem serekîn ezîti û kesebaziya hin kesan, di rêbertiya partiyên Teverga Kurdî de ye . Ji ber ku, kesayeti û berjewenda wan di ser her tiştî re ye , dema ku ezeziya wan bi sernekeve neqencî û karên nebaş dikin .

De ka , Kurdperwerên bi rûmet , em bi hev re , serê van xeyset û riweştan bikin , hîn di dergûşê de em bifetisînin û nehêlibin geşbibin , ta ku kurdayetiya gelê me bi serkeve .

Jiyan Helwest e

Dêrsim Alî

Li dora sala 1924 an, gava şer li dijî Firensiyên li Çiyayê Kurmênc rawestî, leşkerên Firansa derbas navça çiyê bûn. Li dervey gundê Qêsim, gundê Seydê Dîkê, rêberekî berxwedanavavên Kurd bû, leşkerên Firensî avêtin segê Seydê Dîkê û kuştin. Xeber gihîşte Seydo axa. Serleşkerê yekser derbas mala Axê bû, li nava hewşê rawestî, lê Seydo axa derneket bixêrhatina wî. Pişt re gava rê nedît derket lê bi rûyekî tîrş. Serleşker pirsî çima axa derneket pêşwaziya wî.? Wergêr jê re got ku ew li ser seg xeydiye. Serleşker got: Bihayê segê wî çi ye ez bidimê. Seydê lê vegeran got: Segê min wan leşkerên te tevan dike. Ji bona xatirê xudanê malê mera kevîran navê segê wê. Wergêr tirsî ew bersiv wernegerand, lê serleşker lê zor kir ku hewalde, got: Dibêje xwîna segê min leşkerên te tevan dike. Hîngê serleşker serê xwe hejand û ew berve axê çû.

ji bo çî ev roj wisa buha ye

Dr.Memo Abdi

Eger em xwe bidin kûraniya dîrokê û di deryaya çand û rewsenbîriya dewlemend de avjeniyê bikin ,bê guman emê matmayî bimînin û nefretê li xwe û xebata xwe a bi navê rewsenbîrî ku tê nimandin bikin, çî diyarde an jî berhem bi fermanê ketina serhevdûve di dema dîrokî dirêj de xwe pêsdixe bedew dike him ji aliyê sêwaz û forma xwe ve û him jî ji aliyê naverok û astê nivîsandina xwe ve.

Lê di vir de zimanê me kine û em nikarin zêde rexne bikin. Ji ber ku hema di eynî keliyê de wê bersiv amede be bi behaneyê ku em bindestin,û rê li ber çapemniyeke azad û pispor girtiye. Xem nake û ev jî sedemeke rewaye û di rê de ye ,lê katê em dîroka rojnamegeriya kurdî bişopînin e ku, mê rastî tistne seyr û ecêb bên. Ji bo ev sîrovekirina me zelal be em armancdikin rojnamegeriya ya bi zimanê kurdî derdikeve û bi taybet bi zaravê kurmançî,ne tenê ev û bes û ciyê wê jî beşê biçûk ji Kurdistanê ye.

Ev sed û heft salin ku, tekoşin berdewam dike,ji me tevan re diyare ku tu rojname û kovarên bi kurdî derdikevin ta niha forma xwe ya pêwîst li gor demê bê tune ye ,ji rojnameyê bêhtir belavok û broşûrên bi kurdî tên weşandin.

- Naverok û asta nivîszndinê pir jar û lawaze û di bêhtirîn nivîsarên xwe de berhevkirine yan nûçpîkirina tiştê kevine

- Tu pisporî di wan de tune ye ,hema tevane yên ku dinivîsinin yên tagir û

hezkirê ziman û toreya kurdî ne.

- zimanê ku pê tê nivîsandin ji xwe ev bobelata mezine,hema dûrî tu rêzimana ye û pirî caran her nivîsarek bi rêzimanekê ye. Bi gotineke din encûmaneke sernivîsar ji kovarê yan belavokê re tune ye. Di vir de, bê guman yê ziman dizan xwe xilas dike lê yê nû fêr dibe diya wê tê gan ,hema ji rêzimanekî dikeve yekî din,nizane kî raste û kî şaşê.

- Ev hemî weşanên derdikevin, bêhtirê wana partgîrî ne yan jî aligîrê vê tevger û wê partiyê ne ,ev jî sedema herî giring e ku tistê tê nivîsandin nayê xwendin yan jî balkêse ji rêjeyeka pir hindik ji tagir û heyranên zimanê kurdî ve.

- Bi sedema ku, zimanê kurdî qedexeye li vî besî, helbet wê nivîsandina pê astengan û dijiwariyan bibîne. Lê qet me ji berpirsiyariyê azad nake û nayê wê watê ku hema hemî tist bêrêz û pîvan be. Ji lewra, nivîsandina bi kurdî du aliyên wê hene


- Aliyekî pispor û rewsenbîrî ye û aliyê din zimanasiya, yanî kesê Ku belavokeka bi kurdî dixwîne, pêrgî du zehmetiyan tê:yek jê rewsenbîrî ye û ya din pirsgerêk û zimanê rêzimanî ne. Ta radeyekê ez dikarim biçespînim ku, armanç pirê xwendevanan ji xwendina gotareka bi kurdî bi mebesta fêrbûna zimanê kurdî ye ne ku mebesta wê ya ramanî û rewsenbîrî ye

- Ev hemî sedem û astengên me li jor nimandin me hisyar **D.R (6)**

Bîranîa Yilmz Gûney

Reşoyê Pîrê

Di sala 1937 an de, li navçeya Edenê, gundê Yenece, Y. Gûney ji dayîk dibe. Bavê wî, Ehmed¹, Kurdekî Zaza, ji Siwêrekê ye. Di zaroktiya xwe de, ji ber şerê êlan goçberî Edenê dibe . Diya wî, Gulê, ji êleke Kurdên deşta Mûşê ye û malbata wê jî, ji ber şerê cîhanê yê yekem guçberî Edenê dibin.



Y. Gûney, di zaroktiya xwe de, weke hemî zarokên belengaz yê Rojhilata Navîn, di ber xwendina xwe re, pir karan dike. Karê çandiniyê, berdestê goştfiroş û H.W.D . Bavê wî dixwaze bixwîne daku, bibe katibê ser qabana pemboyê. Lê Y. Gûney, dibêje : **Min tiştêkî din dixwast, lê min nizanîbû ew tişt çî ye "**

Y. G çêroka xwe ya yekemîn, ya li ser şerê gundiyan, sala 1952 an, di kovara "Birgûn" de diweşîne . Di wê demê de, pêrgî hin kesên sosyalîst tê û hişyariya wî ya siyasî dest pê dike. Di sal 1955 an de, nivîsarên xwe bi şewakî vekirî diweşîne. Ji ber wan nivîsaran, ji hêla karbidestên Tirk ve, bi piropanganda komonîstan tê gunehkar kirin . Û heft sal û nîvan zîndan û sal û nîvek surgunî didinê-Gunehkariya wî ji ber peyvek li ser zimanê jinekê, di çêrokek wî de weha hatibû " **Ewê rojek dawiya we bê "** -.

Di dû re, ew ceza sivik dibe, dibe salû nîvek zîndan û şeş heyvan surgunî Qoniyê dikin. Rojên surguniya wî ya li Qoniyê, di jiyana Y . G de, qonaqeke girîng bû ..

Di sala 1958 an de, derfeta herî pêwîst, di jiyana Y. G de, bi riya derhinêrê Tirk, Atif Yilmaz bi dest dixwe. Di nivîsandina sînaroya Filmê wî yê bi navê (Gurên vî welatî)de beşdar dibe û di derhinêrê de, dibe cîger û weke lîstevanekî jî, di wî Filmê de dilîze. Ji ber wê jî, deriyên dadgehê lê vedibin . Di sala 1969 an de, dadgeh cezaya dawî didiyê . Y xwe ji ber wê cezayî dide alî û dev ji xwendina aborî ya zanîngeha Stembolê berdide. Sala 1961 an, 18 heyvan di girtîgehê de radikeve. Di girtîgehê de, romana xwe ya pêşîn û dawî ya bi navê " **Ew stûxwar Mirin "** dinivîse . Ew roman, xelata Kemal Orhan, di sala 1972 de werdigre. Di sal 1963 an, di dezgeheke filman de dixebite, li bajaran digere, filaman raberî xwediyên sîneman dike. Di wê demê de, çend çêrok û sîneroyên filman dinivîse. Û di 5 salan de, di bêtirî 60 filmê de weke lîstavan dilîze. Di sal 1968 an de, berpirsiyarê dezgehê pê dihese, ji kar derdixe û jêre dibêje " **Cihê komonîstan li ba min tune ye "** . Di sala 1972 an de, Y . G ji ber piştgirî û xwedîkirina hin xwendekarên şoreşger, yê ji ber destlata Tirk direvin tê girtin. Piştî derketina wî ji zîndanê bi çend heftan sala 1974 an, Y. G bi kuştina dadgehvanekî Tirk **D.R(5)**

Dumahîk : Bîranîna Y. Guny

sûcdar dikin û 18 sal ceza didinê. Y. G di zîndanê de, sîneriyoyê Sê filman "**Kerî, Rê û Em Sibe Sûşeya pacê û du nan dixwazin**" dinivîse .

Y. G ji ber pirtûka a qedexekirî, ya bi navê "**Li sr faşîzmê**" bi 7 sal û nîvan zindan û du sal û nîvan jî surgunî tê cezakerin. Û ji ber nameya wî ya ji Sênor Fernando Herera, berpirsiyarê Fastîvala Valadolid (Españiya) rêkiriye re, dadgeha Tirk wî bi Pênc salan ceza dike .

Piştî teqlekirina leşkerî ya 12 Êlûna 1980 î, Y. Gûney ji welêt direve û berê xwe dide Firansa . Û di Ber Çilê 1981 an de, destlata leşkerî wî ji hemwelatiya Tirkiyê bêpar dike. Di sal 1982 an de, filmê wî Rê, di fastîvala navneteweyî ya Cannes`ê de, xelata zêrîn distîne. Di sala 1982-1983 an de, Romana wî "**Ew Stûxar Mirin**" bi zimanê Firansî dibe film û derdikeve.

Li Firansa, di 24 ê Sibata 1983 an de, Y. Gûney, bi çend ronakbîr û rewşenbêrên Kurd yê navdar re, ji bo parastin û pêşvebirina çanda Kurdî, Enstûtîya Kurdî dadimezrîn .

Y. Gûney, di 09 ê Êlûna 1984 an de, li dûriyê, li nexwaşxaneyek Parîsê çavên xwe dadimrîne û diçe ser dîlovaniya xwe .Berî mirinê, Y.G weseka xwe dike û dibêje ku, ez mirim wî termê min ji mala min rakin ² . Di 13ê Êlûnê de, termê wî tînin enstîtuyê daku, berketiyên wî silava dawî lê bikin. Dêdora çar kat û nîvan, bi qasî 2000 mirov, bi beşdariya şalyarê çanda Firansî Jack Lang, Sefîrê Yonastanê, nûnerê partiya komonîst ê Firansa, sekretêrê yekem ê partiya sosyalîst ê Firansa,

pir hunermend û listevanên sînemeyan , rêxistinên Kurd ji herçar perçan, bilî bi sedan name û tilgiraf ji berketiyên wî gihane enstîtuya Parîsê. Di ber termê wî re derbas dibin, silava dawî lê dikin û serê xanima wî Fatiş û keça wî sax dikin. Di dû re, Y. Gûney, di goristan mêrxwsên Komona Parîsê de vedişêrin.

Helbestvanê gewre, Cegerxwîn, ji enstîtuya Kurdî li Parîsê re vê namê dişîne:

(Mirina dostê min ê hêja Y . Gûney dilê min perçe kir. Ez pir xemgîn im, dil bi dul im.

Yelmez stêrkeke geş bû di esmanê mîletê Kurd de. Pir zû xuricî. Bi mirina wî diwarek mezin ê seqafeta Kurdî hiweşiya.

Feleka bêbext dest neda ku ew merema xwe bibe serî. Filmên nû çêkir, doza Kurdistanê bi cîhanê bide nasîn . Em çi bikin?. Hêvîdar im ko ewê, stêrkên din di esmanê me yê reş û tarî de peyda bibin. Û dewsa wî bigirin.

Mirin li pêşiya me hemiya ye, jêre çare nîne. Tu kes nikare xwe jê xelas bike. Lê gava ew wilo bêbext bi carek tê, hê xedartir e.)

*** -Cavkanî:**

*- Kovara Hêvî . Hejmar 3

* - Kovara Sînemegriyê ya Sûsriyê . Hejmar 23-24. Buhar- Zivistan. 1984-1985

1- Wergêrê nama Y. G. ya ji zîndanê, ji xanima xwe re dişîne . Fadil Çetker, dibêje: Navê bavê Y.G. Hemîd e .

2-Mala wî : Enstîtuya Kurdî Li Parîsê

Sîmfoniya nalînan

Merwan Berekat

Dêwên jînxwar, hovên devbixwîn û çavsor, her û her xwîna dijîtiyê di rehên wan de tîr û reş e, di sernserî dîrokê de, karê wan kuştin, şewtandin, tarûmarkirin, lêdan û jîntarîkirin e.

Li dijî her tiştê rastin, djî tîn û tîrêjen rojê ne, dijî ala sipî . mirovatiyê ne. Dijminên Kurdan di seranserî dîroka nûjen de, xwestine jîna Kurdan reş û tarî bikin, wê pûç bikin, belkî kaninbin wan tune bikin. Bi sedan gulistsn , bêgul kirin û bi hilma genî ji zikên xwe yên reş asîmanê bajarên Kurdan bi jehir kirin. Her û her xwasteka wan e, ku, Kurdan diyarî gora dîrokê bikin. Dixwazin ,di warê me de wekî çeçelan war -war bikin û li dawiyê jî bibêjin, ev qeder yan jî sûcê çerx û felekê ye. Ya rast dijminên Kurdan bê wijdan in, dilopek ji xwîna mirovatiyê di rehên wan de nîne.

Belê rast e, hemî gel û welatên cihanê bi bûyer in û jiyan bê bûyer na be. Lê bûyerên Kurdan bê sînor in, carina jî, wek wan di seranserî cihanê de nînin. Bûyerên xelkê şahî ne û carina jî êş in. Lê yên Kurdan êş û êş in. Belê yên xelkê agir vemrandine, yên Kurdan agir û şewtandin e, bûyerên gelê cihanê ken

û carina girî ye, lê yên Kurdan girî û girî ye.

Ey cihana bêçav, bêguh, bêziman û bédeng... Eger zimanê mirovatiyê di şikefta bîrkirinê de aliqiyê, yan jî raketiyê, lê zanibe ew dawî ye . Vaye roja bi tîn hêdî hêdî tariyê , ji ser eniya xwe hildinaşe, ferhenga tîpan rast dipijiqe û tîpên dadmendiye li rûyê demê meher dibin û rastî dike cêwî bizê.

Belê, nema bûyerên Kurdan di çalên demçê de tevizî dimînin, ne jî wêne ji rûpelên dîrokê tîn dizînin. Bûyerên me di gulistana bîranînen me de payî ne, û wêneyên êş , kul û derdên me, mejiyê me dileqîne , her şev me di xewnê de vediciniqîne. Belê... wêneyên 183 bilbilan ji bilbilên Amedê ji birwaza mejiyê me neketiyê, bêna kuzûrî ji bêvilên rojên me derneketî ye. Roj bi roj kaniya tolistîne derdikin.

Belê eger 16425 roj bi demê derbas bûne, lê ew qêrîn û hawara dayîk û bavan , dema bang dikirin wax lawo o o... wax keçê ê ê û hawara zarokan jî ,di nav terafa êgir de dikete guhên dê û bavan, dema digotin: Bavo o o... anê ê ê... keko o o... yadê... amo û xalo, ew sîmfoniya nalînan ta bi îro maye sazê bûyerên Kurdan. Ew yek li wêneyên li ser qaba dîroka Kurdan e, nayê jibîrkirin... na nayê jibîrkirin.

Dumah.k : Ji bo çî...

dike û me dike

- Azmûneke exlaqî û netewî ye: kesê ku xwe bihejmêrê hilgir û tagirê kurdevariya, pêwîste van wezifeyên xwe bide ber çavên xwe û ji heq wana werê der. Bi kêmanî em aliyê rêzimanî ji wana pêsbixin da ku rêzimanê hevbeş bê pejirandin

Ev jî bi alîkariya nivîskarên hene dighê armanca xwe, ku, armanca parastina ziman û durustkirina nivîsa kurdî pêk bê



Xurexur

Xurexur, rûdaw û pîrsgirêkeke tendurustî û civakî ye girîng e.

Ji sedî heştê û pênc %85 ji mêrên bi jin û %57 ji jinên bi mêr di xew de dikin xurexur.

Ji bilî ku xurexur, mirov bi fedîkirin dide û pîrsgirêkên civakî çê dike, ew pîrsgirêkên tendurustî jî peyda dike.

Mirovê xurxurane baş ranaze, lewre ew herdem sergêj e û bi karê xwe baş ranabe.

Ji bilî wê dema mirov dike xurexur û bêhnbirî dibe, Oksîcên li ser endamên canê mirov kêmbûnê dibe û zîyanê dibînin, bi demê re kane dil biwestîne û nexwaşiyê lê peyda bike. Li hin civak û dewletan, ew dibe sedema hevduberdanê jî.

Xurexur ji poz, dawîya zimên û gewriyê peda dibe, bi teşeyê wan endaman ve girêdayî ye. Lê sedemên wê yên tamar (wîrasî) jî hene, em kanin wan wiha bijmêrin:

- Rewşa razanê: Li gor rewşa govdê mirov li dema razanê. Gengaz heye ku rûdawa xurexurê peyda bibe yan pêtir bibe, nemaze gava mirov li ser piştî raze. Ji lewre, zor girîng e mirovê xurxurane, xwe hîn bike li ser kêlekê raze, û çêtire li ser teniştê rastê xewke.
- Xewa kûr xurexurê bêtir dike. Loma gereke mirov dermanên xewê û hêmeniyê pir nebe. Ji ber

Bijîjkê Nerozê


ku xurexur girantir dibe û metirsiya bêhnçikandinê bilind dibe.

- Meye û cixare xurexurê bêtir dikin, ji lewre zor pêwîste mirov wê bizanibe.
- Roleke qelewbûê ye girîng heye, xurexura mirovê qelew sê caran ji yê normal bêtir e.

Care çiyê?

- Gava yekê: Danîna giraniya laş e. Ji bo wê jî parêzî gerek e. Zor pêwîste mirov hişînayê, meyweyê bixwe û goşt kêmbike. Evên han razanê jî baş dike.
- Zor pêwîste meye û cixare were berdan, û mirov werzişiyê bike. Ji ber ku ew bêhnkişandinê baştir dikin.
- Çi kulbûn di poz û gewriyê de hebin werin dermankirin. Mirov kane ava dermantirşkê jî hilkişîne, ew poz û gewriyê vedike û razaneke vehesî dide.
- Ji bilî wan, û gava ku bêhnbirî nê xedar hebin, birînkari li ser gewriyê tê kirin.

Xurexur rûdaweke îjîdil e, dilmayîn û diltengiyê çê dike. Zor pêwîst e mirov guh bide tendurustiya xwe. Tendurustî tiştêkî pir buhaye, ger mirov lê miqate nebe herdem ji merov re namîne



Xweşiya We Hêviya Me Ye

Nameke vekirî ji hozanê gelê kurd Şivan perwer re



Dîlan Zivimî

Piştî rêz û silavan .. Li dawiya Çiriya paşin , sala – 2005 – an , ew nûça bi êş û jan ya nesaxiya xoşewîst û hozanê hunera kurdî , birêz Şivan perwer gihabû me , xem û qusaweteke mezin xiste dilê tevan ku , li beramberî evqas sal , mirovekî mîna Şivan perwer , di merc û hoyên zor dijwar de , ewî bi serbilindî doza gelê xwe , ew doza çiqas rewa û dadimend , bi deng û awazên xwe yên xweş û şêrîn karîbû li seranserî Kurdistan pêdarî û pêwîstiya evîna welat di hiş û ramanên keç û xortên me de di riya stiranên re biçanda . Giringiya huner , ziman û dîroka kurd bi şêwakî zanistî ji xelikê cîhanê re , we karîbû şirove bikira . Bêgûman , bixêra hunermendên mîna we , huner û kultora kurdî hate vejîn .

Di warê pêvajokiyê de , roj ji

rojê reng vedide , wisan jî , îro nîrxê huner û hunermend cihekî bêlikirî , di nava gel de girtî. Lê , daxwaz û hêviyên me , ku hemî partî û dezgehên me nemaze hikumeta Kurdistanê federal , xwedî li hunermendên me derkevin û tiştine girîng û pêwîst weke sendîqan(نقابات) ji wan re ava bikin .

Li dawî , em ji hêla xwe ve wek rêxistineke jina Kurd li Helebê ya parta Yekîti ya Demiqurata kurd li Sûriyê " Yekîti" û bi navê hemû heval hogir û berketiyên Şivan perwer xweşî û saxiya we hozanê gel Şivan perwer dixwezin û gurzek gulên renga – reng diyarî we dikin . Hêvî û daxweza me ji Xwedê yê dilovan , ew e ku , win careke dî li hembêza gelê Kurd veşerin û bi hêviyên pir bilind xebata hunerî bi dengê we yê xweş û zîz bajon serî .

Dibistanên Zimanê Kurdî

Apê Osnebiran

Komîta hînkarên zimanê kurdî li Helebê û malbata weşana duheyvnameyî "NEWROZ", mêvandariya mamoste M. Şêx Birîmce pejirand . Şevbuhêreke zimanewanî , di êvara /30/12/2005an de , li bajarê Helebê û bi beşdariya /15/ pazdeh şagirt û mamostên zimanê Kurdî , ev şevbuhêrk dest pê dibû .

Mamostê hêja M. Şêx Birîmce , wanake amedekirî , bi sernava "Alfebeya Kurdî" weha danasîn û gote: Ev wana bona kesên , bi Erebbî daxêfin û tîpên Ingilîzî an Fransî Berê nas dikine .

Li pêşî û weke despêkê , wî diyadikir ku , di malan de pir girînge bi Kurdî were axaftin , ev jî berpirsiyariya bavaneBerê xwe dida şagirt û digopt : Tu tîpên Ingilîzî an Feransî nas dikî , wan tîpan binvîse: A B C E F I G ...

Paşê bal dikişande ser tîpên : A E Ê Î Î O U Ū , berdewam dikir û digot: Tîp dengdêr û dengdar in, dengêr xwe deng in , bê alîkariya tîpine dî ew dengdidin ; yêndendar bê deng in û bi alîkariya dengdêran deng bi wan dikevin . Wî dajote û digote : Tîpên dengdêr li pêşiya bêjeyan ,dengêkî bilind û xwe guvaştî ji wan derdikeve , di nava bêjeyan de dengêkî nerm , nizm û sivik didin.

Ev yeka berêz Birîmce jî , baş ji mamostên beşdar têdigeha , ku wan ev tişt nepejirandin . Dixwastin bibêjin : Dengêr he rtim dengdêr in , yek dengî didin . Tîpa (A) nabe

tişteki din , wek: AV MAL BA yek dengê û ne tişteki dî ?! .



Ji dest pir tîbîn û bilinbûna dengên hin maostên beşdar , şanika M. Birîmce ji hêla pirekan ve nedihate erêkirin ; wê jî dikir ku berêz Birîmce , mîvanê wa şevê , bervê waneyê bizîvirîne û bigehe tîpên cewî û du dengî : Ç P K T bê ku (R) jî binavbike . Dîsan deng bilind dibûn , ligel vê jî , wî tîpa "R" weke tîpeke cewî deng nasnekir û digote ev şaşiya Celadet e ku "R" di bêjeya birîn (yanê birîna li giyanweran û xwîn rijandin) û birîn (yanê birîna caw û daran) . Bi wateyêke di , Şêxê me Birîmce , tîpên cewî deng çar : Ç P K T nasdikirin û li tîpa çewî deng ya Celadet "R" xwe lê nedikir xwedî.

Şev burî , tevan xwa21tir ji hevdu dixwastin . Eger çî û çawa bû bila weha be , lê şevê û mamoste M. Şêx birîmce cîyekî bêlikirî li ba şagirt û mamostên zimanê Kurdî li bajarê Helebê digirt û ra bigehine şevine dî bila ziman gel û millet xweş û zindî be .

Agirî

Xala Hevbeş dijberiya Kurdan e , dijberiya tevî Kurdan xala hevbeş ya Turkiyê û Îranê " agirî" . Daxuyaniya Yekîtiya Xwendekarên Demokrat ya Kurdistana Îranê bi hinceta 16 ê Sermawezê , Roja Xwendekar " Y X D K . Demokrasî , biha û piratîka wê , beşa 18 , Kurmac Hakî . Wezîrên Karê Derve Yên Yekîtiya Ewroayê , di daxuyaniyekê de nigeriyana xwe ji rewşa nebaş ya mafên mirovan li Îranê dan xuyakirin " Radyo Ferda" . Civînên Kogreya Neteweyên Îrana Federal , endamên kongreyê : #- Eniya Hevgirtî ya Belûçistana Îranê . #- Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê . #-Partiya Xelkê Belûçistanê . #- Partiya Hevpeywendiya Demokratîk ya Gelê Erebiyê Ehwaza Îranê. #- Rêxistina Şoreşvanên Zehmetêş ya Kurdistana Îranê . #- Komele Rêxistina Berevankar ya Mafên Neteweyî ya Gelê Turkman #- Navenda Çandî ya Azerbaycanê .

16ê Sermawezê , Roja Xwendekar hate pîroz kirin, çend babetên dwelemend ji aliyê hin hevalên beşdar di rê û resmê de hatin xwendin : #- Gotara birêz Cemîl Kulahî , bi navê bizava xewndekarî li Îranê û serhildan û qonaxên wê û astengên ser rêya wê . #- Gotara birêz Şaho Ferazmend li ser bizava xwendekarî a Kurd , Gelo tiştêk bi navî hebûye ? Xalên lawaz û bihêz yên çalakîyên xewndekarên Kurd . #- Gotara birêz Erfan Rehnimûn li ser pêwîstiya avabûna Y X D K Î ,

armanc û meremên wê ji bo pirsên siyasî û civakî . #- Çend gotin ji aliyê helbestvan û rewşenbîra Kurd birêz Fatme Husên Penahî li ser erk û wezîfeyên xwendekarên Kurd di rewşa îro de .

Me Sîstema Demokratîk Heye , Lê Kultura Me ya Demokratîk Tune . Li ser pênaseya civakê , rewşa civaka Kurdî ji aliyên cur be cur ve , jin di civaka Kurdî de û pirsgrêk û astengên jiyana jinan li civaka Kurdî .. armanca hevpeyvînekê bû , ku me bi birêz Rembod Lutfpûrî , rojnamevan û pispor , di ware civaknasîyê de pêk anî .. Hevpeyvîn : Meryem Hacîpûr .

Dema jina Kurd bi zanebûn bibe evînek azadî û rizgariya xwe , ew azadiya welat jî bistînekê , beşa 2 û dawî , ji hevpeyvîna Azad Kurdî , bi helbestvana Kurdî : Evîn Çîçek re. Maf û Mirov gotara ADAR JIYAN , Peymannamey Cihanî ya Mafên Zarokan , beşa(3) ya wergervan :Şehab Xalidî bû. Ferhengeke nenaskirî ya Kurdî Serbest, Pirtûka: Gotar û Wergeran bi Kurdî derket, ya wergêrê Kurd KOSAR FETAHÎ ye , Dr . **Qsimlo** banga aşti û azadiyê , birêz Şehab xalidî hebek ji pirtûka Dr Qasimlo Banga Aştî û Azadiyê diyarî pirtûxaneyê Agirî kiriye.

Ehmedînejad : Divêt li Ewropa de cih bi dewletê Îsraîl re bê dan.

Bi kurtahî ev bûn , sernavên sereke yên xwişka agirî , weşana 15 rojî ya parta bira "Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê ye , li 15ê berçileyê 2005 an e.

Pîrozbahî

Bi hatina cejna sersalê, ez sala nû li we pîroz dikim, bi omîd û hêvî me ku sala 2006-an sala serbestî, wekhevî û azadiyê be.

Bêgumane ku, mirov bi hemî nijad, ziman û olên xwe ve, mafên wan di jiyaneke sebest û bi rûmet de heye, û gereke, tu hêz, tu destelat, tu mirov nikaribe mirovan ser rûçikê vê gerdûne şermezar û riswa bike, wan ji mafên wan bêpar bike. Ango, bi kurtî, gereke tu mirov çavsorîyê li birayê xwe yê mirov neke, ji ber ku

dema hiner û zor dij mirovan hate bikaranîn, yasaya dehlê tete pê, kesê xurt û bi hêz dê yê sifil daqurtîne....!!Bi vî hawî, jiyana ademîzadiyê ser vê zemînê berdewam nabe!!...

Ez bi hêvî me ku sala me ya nû, sala mirov û mirovatîyê be, sala aşî, xweşî û şahiyê be.

Careke din, sersala we, ya gelê me û ya hemî cîhanê pîroz be!!

B.Dara
Qamişlo

Kurte wêneyên ji sala borî

Hesenê Cûmî

Havîne, tîngtînga kurmê Temûzê ye, stûnê toz û telazê gihaye taqê heftan. Di navbera herdu çemên Declê û Ferat de, qîreqîrqa dayîk û zarokane. xwîna sor û germ di kolanên bajar û gundan re diherike, dibe lehî, tevla ava herdu çeman dibe. Bi navê Xwedayê pîroz, serê mirovan tên jêkirin, otombîlên teqînê, li her deverê diteqin, laşên pîrek, zarok, pêremêr û pêrejîn dibin parî û li her deverê balavdin. Di rojên pîroz de, Mizgeft, Kenîseyên Xuristiyan û civatên serxweşiyê, diteqin, bi sedan mirov tene kuştin. wêneya xwînê di jiyana wan de, bûye tabloya Cokinda?!

Rojnemevan û xwediyên peyva azad jî, ji şerê wan hovan ne bêparin. Di sala borî de, derdora 63 rojnemevanan tene kuştin. Ji nav wan, **Semîr Qesîr**, û xwediyê peyva bi nav û deng (**Cudabûna di navbera tarî û ronahiyê de peyv e**) **Cubran Tiwênî** bi otombîlên teqîn tene kuştin.

Li welatê me, her diçe, bivên derve gur dibin. Lê, ta nuha zagonên awerte berdewamin. Kesên di bin xêza birçîbûnê de dijîn, her û her pirdibin û diz û hov jî har û gur dibin. Lwere jî, mafên mirovan tene bînpêkirin. Gelo : Ev mirovê ji hemî mafên mirovatî bêpar, kane li pêş wan bivan bisekine?!

Tayek porê sipî

(Li ser şopa Menfelotî)

Ji kovara Ronahî . Hejmar 131 ê Nîsana 1943 an

Qedrî Can

Îro, sibehê di ber yanê re derbas dibûm. Min, di nav porê serê xwe de tayekî sipî dît..

Mîna birûska nav şeva tarî, diçirisî...

Gava çavê min pê ket, veciniqîm; mîna ko, ji nişkave, şûrek li serê min

keve.. Nola ko yek ji ezmên dakeve, û di destê wî de aleke spî hebe û mizgîna mirinê bide min.. Min fam kir ko, derdekî bî derman e, yan jî tayek ji tayê kefen e...

Ey tayê spî! Min tu rengê spî mîna gewrbûna te reş ...Û tu nûr, qandî nûra te tarî ne dît...Te, her tiştê spî li pîrbûnê...Ey tayê spî! Ez, dibînim ko tu xwedî dek û rip î; tu, hêdîka, di guhê cîranê xwe de dikî «kur û pis» û tu, wan dixapînî, ko ew jî mîna te bibin. û cilên ko te li xwe kiriye ew jî li xwe bikin... Tu dixwazî di nav vî diyarê bê deng û bê gir-gêc de, ceng û cidalekê çêbikî.. da ko herkes di bin lingan de biperçiqe... Tu, mîna însanê spî dikevî nav welatê reşikan û wan dixapînî û tu wan rebenan ji xwe re dikî kole û bende...

Ey tayê spî! Tu kî yî, tu çî yî , kê tu şandiye û karê te li ba min çî ye?? Heke tu mêvanî, kanî izin û destûra ko min daye te? Heke tu bi hevalî hatiye cem min, ez wî hevalê ko min bi xwe re bibe gorinê naxwazim...



ber çavê min reş kir; heta ronahiya hêv û tavê...heta roniyê her du çawan... Û te, her tiştê reş jî li ber çavê min spî kir; heta qijika reş..heta bext û dilê reş...

Ey tayê spî! Te, xwe di kîjan pencerê re avête ser serê min û te, di kîjan rê re xwe gihande cênîka min?! Tu çawan di vê zeviya reş û tarî de, tek û تنها, bê heval û hogir karî bimînî? Qet çavê te ji vê tariya reş natirse?!

Ey tayê spî! Ez nizamim xwe çawan ji te xelas bikim û çawan ji te birevim!! Tu fêdeya wê ji min re nine ko ez te ji cihê te bikişînim yan jî te boyax bikim.. Ez naxwazim ko di nav du misîbetan de bimînîm: misîbeta derewan û misîbeta

Xwedê zane tu mîna wan maran î ko hêlînê her tebayî kuna xwe dizanin.

Ey tayê spî! Min pir ji te gilî û gazin kirin, lê ez dibînim ko ez ne rast im; dîsa tu ji her tiştî, ji her kesî bêtir li ba min bi rûmet, li ber çavê min bi qedr dimînî..Serê min ji te re zozan û pîroz be.. tu ji xwe re –mîna dixwazî-tê de vegevize.

Ez dizanim tu, rêberê mirinê yî, rêberê wê reyê yî ko tu rê lê nabe.. Çima ruyê xwe ji te tîrş bikim? Min ji xortaniya xwe tu xêr ne dît ko ji pîrbûna xwe bitirsim.. Min şêraniya dinê tam nekir ko talbûna axretê madê min tîrş bike...

Wey li ser seran û li ser çawan hatî, ey tayê spî!..

Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re yên di girtîgehên Sûriyê de